KURD LI XORESANÊ

Berhevkirina: B.Roşeng

Xoresan, parêzgeheka pan û berîne mîna welatekê ye. Dikevite bakurê-rojhelatê Îrana evro. Li ser tixûbên Afganîstan û Yekîtiya Sovyet (ya berê), bi taybet li komara Tirkmenîstan ya evro ku ew jî tirknejadin. Xoresan, devereka geleka berfirehe û mirov dişê bibêje mezintirîn parêzgehe bi erdî li seranserî Îranê ye. Ji ber wê meziniyê gelek milet jî tê de dijîn ku yek ji wan miletan kurd in.

Li vêre dibe pirsyar bêne arastekirin:

Awayekê berê van kurdan daye vî welatê veqetyayî ji Kurdistan a dayîk. Jimara wan çend in? li kîjan deverê bi diristî dijîn, aya hêşta rewişt, tîtalên wan mayîne, yan ne? Hemî pirsyaran xwe li serê mirovî didin. Welatê Îranê hemû dema tûşî hêrişên dijwar dibûn, ji layê wan miletên bi rex ve û ew ên li nêzîk dijiyan. Mîna; tirkûmanan, ozbekiyan û moxoliyan ku hemû tirk nejadin û eve bo egerê wê çendê ku şahên Îranê, yek li dûv yekê berevaniyê ji xwe, hukumê xwe û paytextê xwe bikin. Ji bo wê berevaniyê ya ku ew nedişiyan singê wan bigirin, kurd anîne singê wan li rojhelata paytextê Îranê, da ozbekî bajêrî nestînin û pitir bi nav axa Îranê ve neçin. Her wesa, li çaxê Ozbekî ya hêriş birîne ser bajarê Kaşan, (1) tûşî kurdan bûn. Lê kurdan li beramber hêrişkirin û bi ser leşkerê ozbekiyan de girtin û şikandin, êxsîrên Îranê ji destê wan rizgar kirin. Gelek şer û pêkdedan di navbera kurdan û ozbekiyan de heta di navbera Tehran û Xoresan de. Di encam de kurdan ta Xoresan ew rateqandin, ew xeber gehandine Şah Ebas. Şah Ebas dûve çû Oxlan Bûdaqxan, kire mezinê bajarê Meşhed ku evro melbendê Xoresan e û bajarê duyê yê Îranê ye. JI bilî vê çendê kurdên "Çemşegzig" bi rêberiya "Şaqolî Siltan" û kurdên "Zîkî" li welatê "Kerman" (1) bi rêberiya genc Elîxan rahêlane ozbekiyan û heta robarê Cîhot, di wî

demî de Şah Ebas biryar da ku kurdan li wê deverê akincî bike. Van rûdanan hemî ji salên 1007-1010 an koçî heldabûn. (2) Li vêre bo me diyar dibe ku ev kurde yên hatine akincîkirin di çaxê Sefewiya de û heta evro jî hêşta yên lê dijîn. Ev, akincîkirin ne li hukmê şahekê bi tinê hatine encamdan. Belku di hukmê çendîn şahan de bigire ji Şah Îsmaîl, Şah Tehmasp û Şah Ebas. Lê koça mezin ewe, ya li hukmê Siltan Mihemedî babê Şah Ebasî hatiye kirin li sala 1007 ê, mişextî ji weramên(1) Hemî jî, ji bo parastina axa Îranê ji hêrişên ozbekiyan. Li pey serçaweniya mêjoyê; dibêjin di wî demî de %80 ji leşkerên Îranê kurd bûn. Kurdan hukum li ser deverên tixûbî dikirin, bi taybetî li bajêrê Dergez,(3) ya evro. Şah Ebas, navê "Şah Qulî" Siltanê Çemşegzig kire mîrê mîran yê Xoresanê. Li pey de kurdan bajêrê Şêrwan jî dirist kirin. Lê ji ber vî cih biçûk bû, ber bi rojhelat ve jî çûn û li Qûçan jî akincî bûn. Ev cihe yê giringe ji layê serbazî ve, bo cihê hukmê afganiyan. Li dumahiya hukmê sefewiyan kurdan, bajarê Bicnûrd jî dirist kirin û heta evro jî her lê dijîn. Bi dumahî ve çûna hukmê Qaçerya bajêrê Bacgiran jî dirist kirin û bû malbendê Zaferanlo yan Çemşegzig yan Çemoşgezega.

Merdoxî di kitêba mêjoya kurd û Kurdistan de dinivîse: "Ew kurdên şah Ebas li sala 1011 ê mişextî veguhastîne Xoresanê, heft xêlbûn; Zaferanol, Aramanol, Kîwanol, Emarlo, Şadlo, Beçewend û Bawenore. Lê, gelo kurdan ev hemî deverên girtî, tu dibêjî jimara wan çend bûn û niho çendin?

Li pey sereçawe yên mêjoyî dibêjin ku 45 hezar xêzan yan jî nêzîkî 225000 hezar kesa li wêrê akincî kirîbûn. Lê ji ber wan şer û kuştarên hatine kirin li çaxê Nadir Şahî û ew ziyana van kurdan ketî, careka dî 5 hezar xêzanên dîtir li wêrê akincî kirin, ji bilî van kurdên bi zaravê "Guranî" diaxavin ku ew jî li Kelatnadir akincî kirin.

Weku bo me ron û eşkere ye jimara kurdan ne li Kurdistanê û ne ji derveyî wê jimara wan nehatiye diyarkirin. Ji ber gelek egerên şovenî û ramyarî. Ev devere jî her êke ji wan cihên kurd li dijîn û jimara wan bi diristî ne ya diyar e. Bi taybet gelek ji van kurdan yên bûyîne tirk û faris. Lê dirist vê hemiyê re mirov dişê bibêje jimara wan ne kêmtire ji 1 milyon kesan. (7) Nêzîkî 1600 gundan yên heyîn û hemî jî bi zaravê kirmancî diaxivin. Ji bilî ev kurdên li çendîn bajêrên dî yên welatê Xoresan de dijîn weku Bicinûrd, Cacirm, Sebzewar, Nîşabor, Şêrwan, Qoçan, Dergez, Kelatnadir û Meşhed ku evro mezintirîn malbendê kurdaye li Xoresan ku jimareka mezin lê dijîn. Ji bilî van hemiyan, nêzîkî 5 hezar xêzana bi halê koçeratî dijîn li çiyê terş û kewalî û xwedankirina

pezî weku xêlên; Topkanlo, Perwanlo, Qaremanlo, Weranlo, Bajkanlo, Milanlo, Rokanlo, Birîmanlo, Kawanlo, Qackanlo, Emranlo, Badlanlo, Hêzlanlo, Kurdî heşt morxî, Şeranlo, Milayan û Reşwanlo. Hindek ji van xêlan dibine tayîfe jî, bo nimune topkanlo dabeş dibin li ser çendîn tayîfa mîna: Noz, Kurkanlo, Simkanlo, Alo, Kino, Mosaxanî, Aşiq û Axamihemedî.

Kurdên Xoresan dabeşkirîne li ser çendîn xêl û tayîfan ji wan a : Emarlo, (Hînrî fîld) li ser vê xêlê dibêjin nêzîkî 500 malan û li deşta Miros li bakurê-rojava Nîşabor dijîn, Şîene û zimanê xwe parastine.

Nivîserê "Mitle el Şems" dibêje: Deşta Maros, dola spî ya navdar. Çinku xêla Emarlo yê lê akincî ye. Lewma dibêjine vê deverê Emarloyan Kurdistan.

Îzanlo; Yan, Ostanlo, yan Osanlo, yan Esanlo. Jimara wan 1200 hezar mal in. Zimanê wan kurdî, tirkî û farisî jî diaxivin.

Pêçiranlo: Xwedan, mirovên şerker in. Zimanê wan kurdî, farisî û tirkiyî jî.

Badanlo: Yan Behadranlo, axayên wan bi desthelatbûyîne, xwe bi hevpeyman di gel Zaveronlo ya dizanin.

Palkanlo: Li devera Gêristan li ser tixûbî dijîn. Karê wan cotyarî û bi xudan kirina pezî ye. Zimanê wan; bi kurdî, farisî û tirkî jî diaxivin.

Pehlewanlo: Li Bacîgiran, Bicnûrd dijîn. Mirovên rewşenbîr yê jê rabûyîn ku hindek bûyîne mamosta li zankoyan.

Topkanlo: Li seranserî bakûrê Xoresan dijîn. Karê wan cotyarî û xwedankirina pezî ye. Ji bilî van çendîn xêlên dîtir jî yên heyî ku her yek dibe çendîn tîre bo nîmune; Reşwanlo, Rûdkanlo, Zeydanlo, Sêvkanlo, Sêlsipranlo , Şeranlo, Şêxkanlo, Qaçkanlo, Qasmanlo, Qaramanlo, Kawanlo, Goran, Keykanlo, Mîyanlo, Kêwanlo, Weranlo, Hodanlo, Mijdkanlo, Mîlanlo û Namanlo...htd.

Kurdên vê deverê dewerkê gelek giring hebû heta berî rejîma Pehlewî bête ser hukmî. Zimanê kurdî rewaca xwe hebû di nav tirk û farisan de.(8) Lê, her li hatina Riza Şah, bizav kirin bo paş xistin û ji navbirina ziman û kultorê kurdî. Bo nîmune; cilkên kurdî li xwendingeha qedexe kirin, zimanê farisî kire zimanekê resmî û axaftinê bi kurdî qedexe kirin... Her wesa, li ser hukmê kurê wî , Mihemed Rirzayî jî her ew pêkol dikirin û ev bajêrên pitiriya wan kurd bizav kir ku bi hinde miletên dî biguhorin û çi pîte pê nekirin ji layê aborî û rewşenbîrî û saxlemê ve ku bû egera koçkirina gelek kurdan û gelek jî çûne Sîstan û Biloştan.(9) Heta evro jî her lê akincîne. Her wesa, hinek çûne deverên cuda cuda. Kurd li Xoresan yan weku hindek

dibêjinê Kurdistana biçûk. Halê wan xweştir nebûye ji yên kurdên li Kurdistana mezin. Kurdistana, dayîk dijiyan, belku ew jî her yê tûşî nexweşî, girûftarî û dirîndtîrîn rengên tepeseriyê bûyîne. ji ber ku nejadkurd in. Ev reftare jî berî hemî kesan ji layê tirkan ve dihate kirin û axaftineka vebrî de bibêjin ... ewe jî, çi kurd li Xoresanê nînin. Ev reftare bo egerê wê çendê ku gelek kurd netewa xwe ji dest bidin. Hemî têkrayên bûyîne "Şie" li cihê wê çendê ku hemî kurd weku seyda " Kelîmola tewehodî"(11) dibêjin; Kurdên Xoresan pişkekin ji êla Şikaka. (12)

Ev revtara nejadperestî li beî hemiya ji layê parêzgarê wan ve dihate kirin, ew jî nejadtirk bû. Navê wî Wiliyan bû. Lê di ser hindê re kurdan şikyan gelek ji kelepor, rewişt û tîtalên xwe biparêzin. Piştî salên 1980 yê çend rewşenbîrên wê mîna , Kelîmola tewhîdî, şiyan gelek ji rewşenbiriya vê deverê û mêjoya wan diyar kin Hêjaye diyar bikîn ku li berî sala 1980 yê ji bilî radyoya Meşhed, Pişka kurdî çi dezgeyên rewşenbîrî li wî welatî nebûyîne.Ev radyoye jî li pey pêşniyara Xan Qarçûrlo ve hatîbû danan ku ew jî nûnerê "Bicinordê" bû li Civata Şora Milî. Raste, dibe vê radyoyê gelek dewrê xwe nedîtîbe û erkê ketiye ser mila bi diristî nerakiribe, lê ser hinê re şiya gelek ji stiran û keleporê kurdî yê wê deverê biparêze û ji mirinê rizgar kirîbe. Bi taybetî ku ev devere jî mîna hemî Kurdistanê ya dewlemende bi keleporê stirana. Kurda, li cejna "Tos"(13) li berî serketina şoreşa Îslamî li Îranê ew stiran li ser gorê hozanvanê mezinê Îranê Fîrdewsî (14) digotin û yariyên kurdî dikirin û...

Regezperêsta, gelek pêkol kirin ku yên dikin jî ji nav birin û nehêlana dîrok û rewşenbiriya kurdî heta radeyekê yên şişyî zimanê wan ji nav bibin. Lê heta niho neşiyane hestên wan ya netewayetî bikujin û evro eger, desthelat jî bin rojek her dê bê ku li xwe hişyar bin weku çawa gelek milet hişyar bûyîne û hayî ji xwe bûyîne, lê, bê ku bi kurdî naxivin!? Gelek kesên, xelkê wê deverê yê bibîne eger zanîba tu kurdî de bêjîte min Kurmanc im yan jî da bibêjin; Xelk dibêjin me kurmanc.

Bê guman, rojek dê bête ku zelamên zîrek mîna, Cecûxan. (15) Û Xweda Wêrdî, gelekên dî jê rabin. Xwe li cenga Îraq û Îran jî demê digotin; Gurdanî Quçan, Fewca Quçan (16) ya pişikdare, wate şerên mezin û dijwar in. Çinku, ev kurdane ya bi nav û deng bibû şerekê, zîrekî ya xwe, eve jî bi rast dibite tirsa dijmina eger rojekê wan hest bi kurdayetiya xwe kirin. Di ser wê himiyê re hêşta gelek ji ziman û rewiştên xwe yên parastin û gelek jî her bi axaftina zikmakî (kurmanci ya jorî) diaxivin. Nimune: li ser çend peyveka ku ew pêkar dihênin:

Adem : Mirov Dirav : Pare
Atam : Hêdî Rind : Ciwan
Ajnî : Hos Ro : Roj
Asan : Sanah Sîs : Spî
Bav : Bab Sol : Pêlav
Beroş : Qazan So : Sih, Sîber
Bere : Cencere Sêpî : Sêpêk, (ji dara dirist
Pan : Pehn dikin bo hilawêstina Meşkê)
Pirê : Pir, (cisir) Kum : Kulav
Parso : perasî Kasnî : Giyayeke
Hina : Xena Kalan : Gundor
Xan : Meznê eşîretê Gotî : Xirab
yan serok êl. Hîvalek: yan jî cerîvek...htd
Xêzan : Biçûk

Dalan : Bersiv (eywan)

Her wesa, hêşta karên xwe yên destî jî, ji dest nedayîne û cacmên18 Kurmancî li wê deverê bi nav û deng in. Jin û keçên kurdan bi rêstina Cacma gelek hunermend in û çi karxane neşên wan cacma birêsin ewên ew dirêsin û yên hatine niyasîn ku ji armîşî baştir û bihatir.

Li vê deverê hozanvan jî yên jê rabûyîn bû nîmune; Cefer Qulîxanî Zengul. (19) Nîmuneyek li ser parçeyek hozaneka wî :

Bismilah ez divêjim
Divêjim navê Peyxember.
Ji xelkî bi ageh vî Te çi gutîye daver
Mihemed (s) Mistefa
Heye axerîn serwer
Bede ez wî Elî (E) Îmam Le Şîe kulê yawer
Qulîbeg Ezîz û şair derev navêje
Tendûr eger dax nevî, nanê genim napêje... htd

Li domahî hîvî dikim ew jî li ser axa çar sed salî ku xwîn li ser rêtîn serbest û aza bijîn, yan jî careka dî vegerîne ser axa bab û kalan li Kurdistaneka rizgar0kirî serbest û tena bijîn.

PERAWÊZ Û DEHMEN

1- Kaşan, Kerman, Weramîn : Sê bajêrên li jêriya paytextê Îranê.

Kaşan : Cihekê navdare bi çêkirina baştirîn cûrên mehfîran li cîhanê.

Kerman : Navê wê folklorê kurdî de yê heyî ku cihê baştirîn cûrên şîraye.

Nê şîrê min ê eslî ye
Eslê xwe de Germaniye
Asinê wî birîsî ye
Ser şeqa wî ji pîlî ye
Çil çerxî li devî dayî ye...htd.

Weramîn : Bajêrekê gelekê nêzîkî paytextê Tehran e.

2- Mînorskî dibêjit ; ev kurde ji salên 1736-1747 ê zayînî yên hatîne akincîkirin.

3- Dergez : Bajêrekê tixûbî ye û kurdan li cihê bajêrî (diron yan dirongir) yê hatiye diristkirin. Ev bajêre du carekê yê kavil bû ye. Carekê ji layê Ozbeka ve, ew demê bajêrê bi navê "Diron" û cara duwê

li hukumê Qaçariya ji layê Turkumanan ve. Belê, bi rêberiya, Nasiredîn Şah emîr Husên Xanê Êlîxanî, Hakimê Quçan û bi harikariya, Heyder Qulî Xanî, Êlîxanî bicinord careka dî dirist kirine ve.

4- Gelek bajêr û dever bi vî navî yên heyîn li Qevqaz, Îraqê û Loristan.

5- Paşgirê(Lo) Tirkiye, gelek kurdan nejadê xwe yên ji dest dayîn û yên bûyîne tirk.

6- Bacgiran : Nahyeyeka tixûbî ye, eşîreta Zeferanol û gelek eşîretên dî lê dijîn.

7- Ji bilî wan Nadir Şah du hezar mal veguhastîne devera Geylan li nêzîkî derya Xezer (Qezwîn) de ewe jî li sîngê Rûsa rawestin û ta evro jî hêşta yên li wêrê dijîn û nêzîkî 60 gunda yên heyîn û gelek gurankarî bi ser jiyana wan de nehatîne kirin.

8- Ji ber zîrekî û çelengiya kurda û zêdebarî pte pê kirina Şahên Îranê bi kurda ji bo berjewendî ya xwe , her wesa dewlemendiya folklorê kurdî.

9- Sîstan û biloştan : Parêzgeheka Îranê ye. Xelkê wê Biloşin, dikevite ser tixûbê Pakîstanê li başûrê-rojhelata Îranê. Biloştan a Îranê ya veqetyaye ji Biloştana Pakîstanê. Ware ev welate jî pê parçe kirî ye malbendê Biloştana Îranê bajêrê Zahdane û yê Bioştana Pakîstan bajêrê kuwîtaye.

10- Serok eşîrertên kurdan evên koç kirine Xoresan, gelek hez ji şahên Sefewî dikirin û di navbera wan de gelek ya xweş bû. Dostaniya wan ew gehandîne wê çendê ku bibine şîe û zimanê xwe ji dest bidin. Piştî çend qonaxan gelek jê bibûne tirk, mîna eşîretên; Aryanlo, Belkanlo, Pîsranlo, Çirktanlo û Badanlo...

11- Ji ber karê vî nivîserî yê giring di vê deverê de fere bidîne niyasîn.

KELÎMOLAL TEWEHODÎ

-Li sala 1940 ê zayînî li gundê, Oxan yê ji dayîk bû yî. Lîsans bi Miarifî Îslamî, li zankoya Mişehid ya wergirtî. Çendîn kitêb û babet yên heyîn, bo nîmone;

¤- Hereket tarîxî kird be Xoresan. Bi zimanê Farisî 6 berge, çend berg jê hatine çapkirin.

¤- Bendên kurmancan, bi farisî, kurdî û latînî.

¤- Babetên cûre cûra li ser rewşenbîrî, edeb, huner, mirov niyasînî û ... yên mayî.

Bi kurtî tewehdî dibîje , min 24 kitêb hene, lê ji destkurtiya xwe neşêm çap bikim.

12- Şikak; Eşîreteke, pitiriya wan li ser tixûbê Îranê û tirkiye evro dijîn û sinî ne.

13- Tos : Bajareke dikevite joriya bajêrê Meşhed û geleka nîzîke.

14- Fîrdewsî : Hozanvanê mezin ê Îranê ye.

15- Cecû xan : Êke ji qehremanên sed salên domahiyê.

16- Quçan : Bajarekê kurdnişîne. Hevalekê got; demê cara yekê min ev bajêre dîtî ez li ser dawetekê hilbûm, dawet kurdî û awaza kurdî lê peyv farisî digot yekser min zanî xelkê vî bajêrî kurd e. Hindek ji peyvên stiranê li bîrê bûn.

Îmroz du roze (Evro du roje)
Firda seroze (Siba sê roje)
Rişîd niyomid (Reşîd nehat)
Dilim mîsozd (Dilê min disojit)
Hay hay Reşîd xan
(Hay hay Reşîd xan)
Serdar kurd Quçan
(Serdarê kurdên Qoçan

17- Peyva (hevalek) min ji biraderekê bihîst ku bo demekê dirêj li wê deverê yê jiyayî.

18- Cacim : Yan hindek dibêjinê Cacîm, ji mêzerka mezintirin û ji rîsî dirist dikin û bo gelek karan bi kar dihînin weku perda û perya li ser nivîna de didin û danine ser milê xwe... û gelek karên dî.

19- Tewehodî li ser vî hazanvanî dibêje : Piştî min (Qird el hisnet) wergirtî ku ew jî harikariyeke ji layê dewleta ve. Min şiya dîwana wî bêxime bin çapê.

JÊDER:

1- Pind Kurdmancî: Ehmed Edî 1988 ê, çapxana gasric Bicinord.

2- Pêşeng : Hijmara 17 ê . Gelavêja 1989 ê, koça kurdan bo Xoresan, Qazî Ehmed.

3- Kovara Pêşeng : Hejmara 20 ê tîrmeha 1990 ê, çavpêketin li gel mamosta Tewehodî, bi filad.

4- Kovara Pêşeng: Hejmara 21 ê, ç, êkê 1991 ê raperînî xweda wêrdî le Xoresan, Tewehodî.

5- Kovara serhildan : Hijmare 4-5, 1993 ê, serhildana Xido li Xoresanê, Ehmed Hecî.

6- Xêl û tayîfekanî eşayerî kurdî Îran, Seyîd Elî Mîrniya. Wergêran; Şewket Şêx Yezdîn, 1995 .

7- El ekrad, milahezat û întibaet, v,v, Mînorskî. Tercîme: Dr. Mierof Xeznedar, Bexda 1968.

8- Kurdistan û elekrad, Dr Ebdirehman Qasimlo.

9- Cerîdet elîtîhat, eledet 60, 1994, eqbah Xoresan, Mazalt tesdîh, Bûrhan Biradost.